

%100 KURDÎ

pîne

ERAQIYA BELAŞ MELE JÎ VEDDXWINI..

KOVARA QERFÎ Û WÊJYÎ



kovara qerfî û wêjyî ya nîv mehî 16-31 ekim (kewçêr) 2000 Sayî: 24 500.000 TL

HER KES DIBÊJE NÊR E TIRKIYE DIBÊJE BIDOŞ!

Dayikên Aştiyê yên ku bi rêberiya nivîskarê Pîneyê Murat Batgî, ji bo aştiya di navbera PKK û YNK de çûbûn başûr, ji aliyê rayedarên tirk ve hatin derdestkirin.

QOMISERÊ MIN
MERIV VAN
DAVÊJE HEPSE?..
GELO TIŞTEK NEYÊ
SERÊ ME

BI...
BISMILAH!..
NIZANIM ULAN
DEWLETA ME
MEZINE...



ZORNAME!

Ord. Prof. Dr. Mûrad Batgîcan voltabaş!..
Kakacan te gotiye, bila nameyan ji min re bişînin.
Ma bi dar zorê name tê nivîsandin!.. Bila be!.. Ez didim xatirê xebata ku te kiriye, lewma vê zornameyê ji te re dinivîsim!.. Xwedê bike dawiya wê were!.. Ka ezê qala çî bikim!..

Kuro qaşo we dê şer rawestanda, lê hindik ma ku şerê cîhanê yê sêyemîn biqewime: Bi saya serê we, tîpên futbolê yên Dihok û Zaxoyê bi tanq û topan û moşekavêjan ketin qirika hev!.. Ev jî baş e; pêşketin heye. Berê li ser mirîşkekê gundan qira hev dianî!..

Li vê derê rewş û hal dîsa "îdare ye!.." Nebû, em ji vê bersiva "îdare ye!.." nefilitîn. Jixwe bi zimanê dîplomatîk dibêjin "îdare ye!.."

Di vê navberê de dema te Dayika Şekemaz dît, jê re bêje "Pîneyê dixwaze te transfer bike!" Lewre dibe ku berî me CNN we transfer bike. Malavayê!.. Wekî Peter Armet radigihand ji Başûr!.. Jixwe kurdiya we ji ya Celadet Bedirxan akademîkîr û kurdewarîtir el.. (Aqubet li serê televîzyonê be!.. Lewre carna "bivir li pêvajoyê dixin")

Wekî din jî me bê te, "pîrozbahiya salvegera Pîneyê" li dar xist!.. Bêrîka patronan germ bû, lê ya me hîna Sîbîrya ye!.. Jixwe Heyvasor ji patronan dilzinar û bêmantir el!..

Di şevbuhêrka Pîneyê de Mele Selîm got, "Dengê min jî xweş el!.. Ez jî dixwazim kasêta xwe derxim!.. Navê kasêta min jî 'Oy Belediye'..." Paşê jî strana xwe got, "Oy oyooo belediye ji boy çî te ez hiştim ji mizgeftan/ Emrê min pêncî ye xuya dikim mîna gêjan/ Te rehetî ji ba min rakir, gêzik li cem min danî/ Oy oyoo finansman/ Qeda li Îller Banqasî bikeve/ Ez bi sê dengan dibêm finansman!.." Piştî vê stranê kesî negot, 'ezê kasêta te derxim' û Mele Selîm bi darê zorê ji ser kursiyê hate hildan. Tê gotin ku Mele Selîm gel hildide û diçin "diaya finansmanê" dikin!..

Li aliyê din jî Ferîdun Çelîk jî kete nava gel, me bi darê çekê ew ji nava gel derxist!.. Qesem bi navê xwedê ew û gel bûn şîr û şekir!.. (Heyran hema nemaye hûn bêjin 'bila Ferîdun Çelîk were bi lorîkan me bike xewê!..')

Kuro ji bîr neke!.. Dema tu vejeriya ji me re nokên Mêrdînê û "Çîka Mîdyadê" bîne!.. Yek jî bi têra xwe pêgermokê(volta) bigerîne, da ku tu rehet bibî!..


Nameya me li diyaran, rehmet li dê û bavê aşîxwazan, ji xeynî şerxwaz û çeteyên li pişt dîwaran!..

Silav û kulav!..

Têbînî: Nivîskarê me Mûrad Batgî, ligel Dayikên Aştiyê, ji bo şerê di navbera PKK û YNK'ê bê rawestandî çûbû Başûr, lê li vejerê, bi hinceta "yardim-yataxlîxê", hatin derdestkirin. Batgî, li Girtîgeha Sîlopiyê, pênc Dayikên Aştiyê jî li Girtîgeha Mêrdînê girtî ne!.. Wan bê name nehêlin!..

Rîzo - Dîzo

İMAM cici



DOZO


BİRECAN



* BESLEME ÇANTASI.



MIJARA BERGÊ



Murat Demirel bi lez û bez bi hevtawana (suç ortağı) xwe re zewicî!.. Êdî ew nikarin li dijî hev îfadeyê bidin!..



Çortî û çorsiya Tansu Çillerê da navê!.. İca got, "Divê em 30 hezar ermeniyên ku ne welatîyên Tirkiyeyê ne dersînor bikin!.."



Filistinîyan li dijî êrişên Îsraîlê kevirkanikeke mezin çêkir!..



Rojnameya Evrenselê bo 10 rojan hate girtin!..



Li Dêrsimê gemaroya xurekan (gıda ambargosu) rabû!..



ŞEŞ SA
SOR

Teğoçî?

Em 30 hezar ermeniyên dersînor bikin!..

Tansu Çiller

KURDÊN POST-MODERN!!!!...

FEQE ŞAKİR

Di dema feqetiyê de çavnêriya keçikên hijdeh salî dikir. Lê, piştî ku bû mele û çar jin ji xwe re anîn, ji ezaban re nivîstên doxingirtinê çêkirin. Dema ku destana **Memê Alan** bihîst, li gund qelenê keçikan qedexa kir. Ji ber vê yekê jî bi şêxê herêmê re şer kir û li wî gundî bar kir. Vêga di siyasetê de "**masterê**" dike û bo ciwanan jî şîretên "Konfûçyûs" berhev dike. Dîn û îmana wî jî "**özeleştiri**" û pêşniyaran diçe û di civnên politîk de jî xewa wî tê.

HANSÊ MARQEREST

Navê wî yê rastîn **Hesenê Marqelî** bû, lê piştî ku çû Ewropayê û emeliyata estetîk bû, navê xwe jî guherand. Ji bo karê xwe bi hemû rêxistinên re têkilî danî û bû aboneyê **Ozgur Politikayê**. Şerab û ereqa ku venexwarî, dest û piyê ku maçî nekirî tuneye. Ji bilî zimanê xwe bi pênc zimanan dizane. Ji tîrsa hevalên xwe tevî meşên li Elmanyayê dibê û qedexeya li ser Pîneyê şermezar dike, lê alerjiya wî jî peyva "welêt" û "**cemedaniyê koçeran**" diçe.

BEKOYÊ MISTÊ

Piştî Şoreşa Îranê li ser sînor dest bi bazirganiya pez kir. Dema ku li sîxurên **CIA** û **MOSSAD** ê rast hat, dev ji jina xwe berda û çû qursa zimên. Di demeke kin de hînlî îngilizî, farişî, erebî û tirkî bû. Li Rojhilata Navîn deh salan sîxurtî kir û bû sedemê şerê Îran û Iraqê. Lê ji ber zimanê dirêj, ji sîxurtiyê hate teqewîtkirin. Vêga ji bo sazîya "**Navenda Nexweşiyên Civakê**" lêkolînan dike û her şev di televîzyonan de tevî benameyên siyasî dibê.

ELIYÊ FATÊ

Berê şivanê pêz bû. Piştî ku gundê wan hate şewitandin û koç kir Stenbolê, bû çayfiroşê sûka zêgeran. Dû re mîna filmê tirkan, bû xwediye pênc-şes kargehan. Li pey hev şirketên mezin ava kirin û kete borsayê. Vêga serokatiya holdîngên xwe dike û ji bo standina patentên "**Viagra û Lensê Çavan**" di nav hewldanan de ye. Hemû bilêtên **HADEP**ê û kasetên **NÇM**ê dikire. Di hîlbijartinên dawî de negihîşt miraza xwe, lê belê ji bo yê nû, hîna vêga di navend û kulîsan de lotikan diavêje.

REMOYÊ HECİBEKİR

Dema ku bavê wî bi komployeke dêmaniyan hate kuştin, bû serokê eşîra xwe. Lê piştî ku "înternet" nas kir û tê de "çet" kir, eşîra xwe hilweşand û ji dev axatiya pêncî hezar mêran berda. Ji bo ku partiyeke îberal ava bike, kete nava tevgerên siyasî. Lê ji ber ku her kesî doza pere û axatiyê kir, bi ser neket. Piştî vê yekê bawerî û têkiliya xwe ji mirovan birî. Vêga pisîkên **Wanê** xwedî dike û serpêhatiyên xwe dinivîsîne.

SİLÊMANÊ REŞO



Dema ku astronotê Rus **Yurî Gagarîn** çû fezayê, wî got "**haşa, sümme haşa**". Gava firok dîtî, çû li cem Şêx tobe kir û jê re got "**Şêxê min roja qiyametê kengê ye?**" Lê piştî ku televîzyon hatin welêt û xatûnên bedew tê de dîtî, çavê wî vebû û di navbera **Colemêrg** û **Stocholmê** de dest bi ixracata "**toza şekirê spî**" kir. Heta niha bîst û pênc otobas û sê heb jî keştî kirîne. Pê otobosan girseyan dibê qada çalakiyan, pê keştiyan jî rêwiyan diguhêzinê peravên Îtalyayê. Îmana wî jî gotina "**Abê ez jî mehkumê siyasî me**" diçe..

EVDILE KOÇER

Têbînî: Jixwe hûn dizanin nivîsa **Murat Batgî** çima nehate weşandin!.. Voltabaş!..



ŞEKIRÊ QULQULÎ CEM ŞEKER



MANTIQ Û QEHPIKI..

Xelîl xwendina xwe ya bilind kuta kiriyê û vegeriya navçeyê. Dawo meraqçî û şewitiyê ilm û xwendinê ye. Loma ew tavilê diçe mala Xelîl. Piştî xêrhatinê û bixêrbûnê jî Xelîl dipirse.

- Kekê Xelîl te çî xwend, tu bûyî çî?

- Min ilmê mantiqê xwend û ez bûm mantiqnas.

- Ero mantiq çî ye, mantiqnas çî karî dikin? Bi ilmê mantiqê tu dikarî textorî an muhendîsiyê bikî?

- Ez nikarim textoriyê bikim. Lê ilmê mantiqê bi kêrî her karî tê û divê her kes bi ilmê mantiqê bizanibe. Ezê bi mîsalekê maneya vê jî te re bêjim. Mesela li mala we kûçik heyê?

- Belê heye!..

- Nexwe bexçeyê mala we jî heyê û mala we mezin e.

- Belê rast e!..

Xelîl tiliya xwe ya nîşanê dide ser cênika xwe ya rastê û bi pisporî dibêje, "Mantiq ev e: ilmê fikir û ramanê ye." Xelîl didomîne.

- Ger bexçeyê we hebe û mala we mezin be, odayên mala we jî zehf in, ne wisa?

- Belê, Qur'an ev jî rast e!.. Kuro ev çî ilmekî xweş lo!..

Xelîl bi kêfxweşiya fêrkirinê didomîne.

- Ger odayên mala we zehf bin, nexwe mêvanên we jî zehf in û diya te xizmeta mêvanan dike.

- Welê ev jî rast derket!..

Xelîl mîna remildar ango falbazan bi peyvên dilfêze û hunerê ilmê mantiqê diyarî çavan dike. Û tê fînalê..

- Ger diya te mêvanan dihewîne, diya te jî mêvanan û xizmetê pir hez dike. Nexwe diya te jî neke bi eslê, eşîrê û muhteremê.

- Belê!..

Dawo jî hebûna kûçikê malê gihîştibû muhteremiya diya xwe. Wî jî mantiqê gelekî hez kiribû. Wê rojê heta destê sibê, wî jî xwe re gelek mînak çêdike û spadariya xwe jî Xelîl re pêşkêş dike.

Dawo roja din, mîna alîmekî bixwebawer diçe qehwexaneyê. Li ser kursiyekî bilind rûdine, lingên xwe diavêje ser hev du, tiliya xwe dikute cênika rastê û hûr û kûr dirame. Hevalekî Dawo tê cem û jê dipirse:

- Dawo te xêr e!.. Tu çî difikirî?

- Ilmê mantiqê!..

- Kuro lawo mantiq çî ye, bi kêrî çî tê?

- Mantiq ilmekî zor xos e!.. Ka ezê bi mîsalekê te hînî mantiqê bikim!.. Bêje min, li mala kûçik heyê?

- Na!..

Dawo piçekî difikire û li gorî ilmê mantiqê yê ku ew fêr bûbû, kurtebir dibêje:

- Nexwe diya te qehpik e!..

Têbînî: Ev pêkenok jî birêz Dr. Dexil ê êzdî hatiye wergirtin. Dr. Xelîl li Hewlêrê cerrahê Nexweşxaneyê Rizgarî û rêberê Yekîtiya Bijîşkên Kurdistanê ye.



MUWAQETEN* BI XATIRÊ WE!..

Dîsa merheba û rojbaş!..
 Û vê gavê bi xatirê we!..
 Bi xatirê we, ji ber ku karê min pir e!
 Bi xatirê we, ji ber ku ez pê re nagihêm ku her du hefteyan carê binivîsim!
 Bi xatirê we, ji ber ku piraniya kurdan jî pê re nagihên ku du hefteyan carê kovareke bi kurdî bixwînin!..
 Bi xatirê we, ji ber ku ez naxwazim mêjîyê gelek kurdan têk bidim! Çimkî gelekên me 14 rojan bi tirkî dixwînin, li tirkî guhdarî dikin, li tirkî temaşe dikin, li gorî wê ji xwe re "şekillenmîş" dibin û 15 rojan carekê bi navê PÎNE tişteki bi kurdî/yanê bi zimanekî din tê ber wan û mêjîyê wan tevlihev dike.
 Bi xatirê we, ji ber ku piraniya kurdan li mala xwe bi kurdî napeyivin!..
 Bi xatirê we, ji ber ku li qahwe, komele, civîn û mivînan kurd bi kurdî napeyivin!..
 Bi xatirê we, bi xêra kurdên tirkîaxêf, kurdî li ber sekratê ye!
 Bi xatirê we, lê em kurd bi xwe dikarin kurdî ji ber sekratê xelas bikin!..
 Bi xatirê we, lê carna ezê werim ka kurdî di çi rewşê de ye!..
 Vê gavê bi xatirê we!
 LÊ EZÊ CARNA DI NAVA RÛPELÊN PÎNEYÊ DE SILAVEKE GERM BIDIM WE!..

Ev jî xelata Nobelê -pardon- ya Cejna Remezanê ye bo we!

ÇI SAXLEM E!

Melle di odeya gund de waazê dide:
 - Destmêj bingeha herî saxlem ya îbadetê ye....
 Gundiyek hema di cih de dibêje:
 - Ev çi saxlemî ye ku bi tirrekê xera dibe!

BÊQERAR

- Ero rast e ku ji bo te dibêjin kesekî bêqerar e?
 - Hem erê û hem na!

YÊ JI TUNEBÛNÊ ÇÊTIR!

Derî lê dikeve, birayê biçûk diçe vedike û ji ber derî bang li xwişka xwe ya mezin dike:
 - Yê ji tunebûnê çêtir hatiye, dixwaze te bibe sînemayê!

* yanî geçî olereqten



LOZIN



Haydar IŞIK

MEMÛR

Wexto ke ez doman biyo, memûrenê dewlet ra zaf ter-sayê. Wextê ma de kamî ke rûşwet da, kare înan ameyê viraştene, La belê kamî ke rûşwet nêda, raya ey jî biyêne derg. Seronê peyîne de, rojê ez şiyô daîra nifus û mi waşt ke nifus cuzdanî bijêrî, çike nifusa kan min kerdbî vinî.

Min ci ra derdê xo vat û verê çeverî de vineto. Xeylê dima memûr begî vat: "Gereke ti ma pêrin rê tek û tek bardaxê do biyarê". Hopala o çiko? Mi vat memûr beg ez jî memûro. Ey jî vat ke, tenêna rind, eke ti jî memûrê, hal û dirumê memûran rind zonenê.

Eve rastiye ez vana, min des memûranê ay rê do ard. Nika memûrê qışkek do wazenê, memûrê girs jî banka kenê tol (veng). Coka jî nifus de fiqarey do şimenê, Demirel jî Egebank ra torve torve Dolar poşt keno beno çê. Bira ez rast vana, helal bo!

Kam ke gemiya xo derya de rind rameno, ey rê helal bo. Ala niyade, ala niyade, eke fikrê şima niyo, ez vana xelata şima esta. Nika eke ti bese nêkena, veng meke Yahya bûro.

Min memûr vat, wazen ke tenê jî memûranê de Almanan ser vajî. Rojê min yew heval berd sosyal ke, hetkarîn bicêro. Min ci rê wergerîn kerdêne. Memûr zaf herdisin bî. Vat wa hevalê to mezexane de kar bikero. Saete de 2 Mark dame ci. Heşt saet şiro bixebetiyô.

Mi vat, birêz memûr, aha no hevalê min mamoste yo. Memûr vat, na und? Yanî ez se bikerî? Eve dostiyê mi ci rê wastena xo vat ke, karo niyanên goreyê mamoste niyo. Memûrê Almanî uşt ra xo ser û bi hêrsa vat: Yanî ti wazenê ke yew mercedes jî bidime?

ROJÊ

Li Başûr tîpên fitbolê yê Zaxo û Dihokê bi tenq û topan bi hev ketin!..

* Li Amedê polêsan avêt ser kewarên cixareya Delalê!..

DELAL!...
CIXAREYA NOSTALJİK!...
EV TIŞTÎ, ME
DI BIÇUKTIYA XWE
DE DIKIR...!
HEY DINYAYÊ!...



TU ACIZ
NABÎ NE WISA
XALÊ EVDO?..
HEBKÎ CAMÊ
TE ŞIKIYA...


NA HEYRAN
NA!..
NE XEM E!.. HÛN
SAX BIN!..
JÎ HEVALÊN TE YÊN
TOPÊ RE SILAV Û
HURMET!..

* Li Amedê 5 mamoste ji ber ku bi kurdî dawetname nivîsandin, ji kar hatin dûrxistin.



KOMISERÊ MIN EV DAWETNAME
JÎ BO WE ŞAND!..
EZ NE ŞAŞ BIM, WE BI ZIMANEKÎ
QEDÊ XE DAWETNAME
NIVÎSANDIYE, NE WISA?..

* Bi pêşengiya Yılmaz Erdogan Pira Çandê ya Stenbol û Colemergê hate avakirin.



EHM!..
PÊŞI WÊ KÎ
DERBAS
BINE?..


KÊ
EZ ANÎM
VIR!?

JÎ STENBOLÊ HEYA
ÇOLEMERGÊ PIRA ÇANDÊ
TIŞTEKÎ BAŞE, LÊ QEY HAYA
VAN JÎ VÊ PIRA HANÊ
TUNEÛ?.. NIÇ.. NIÇ...

JÎ WÊ KE
QORNA
XERE!

ELESTELIS

SEFER SEVI



PATIR!



GIRARA QEREGİYAN

GIRARA TV'YA KURDÎ

Ez di wê baweriyê de me ku hûn jî wekî min gelek caran li ser xebatkarên televîzyona kurdî tirsiyane yan jî li ser mêvanên wan gava ji nişke ve disekine, wekî ku, Xwedê neke, bayê falcê yê pûçkirinê li wan bixe.

Tu dibînî yek, bi dilgermî, dipeyive, ji nişke ve disekine; çav vekirî, dev vekirî û dest li hewa dimîne. Temaşevan jî dibê qey, dîsa Xwedê neke, rih jê çû, lê gava piştî kêlîkekê ji wê pûçbûnê xelas dibê û peyvên xwe berdewam dike, temaşevan jî pê re dibê "Elhemdulilaaah" ku şaştiyeke teknîkî bû û ne ezraîl bû.

Yanî mirov dibê qey tim Ezraîl di pişt televîzyona kurdî de xwe veşartîye, sal jî der-


bas dibin û Ez Med- me ME venake. Jixwe doza welêt bû dî van herdû qey alfabeya l van herdû tîp Xwedê ji (m Jixwe dîmen derdikevin jî q

Aniha jî ez bêjim: Mihem "ez çûme nav bi van gotinar her du lingên teniya binê bû û du kesên dî tevîr bi hesina Dengbêj digo dikim meylê", kêreke mezin û pirîsk mirîsk Dengbêj digo de vebûn sor

TABLÊTÊN

QRALÊ MIN, EZ XWELIYA BIN LINGÊ TE BIM!.. XWARZIYÊ MIN BETAL E, DI SERAYA XWIE DE JÊ RE QADROYEKE VEKE!..

ÛLAN TE HEN XWAR WÊ LI OXX... ÎMPA



XELASKAR...

IMAM CICI

ELİM
USIV

xiyarê kesidandî li Kurdistanê difirotin. Dengbêj digot, "tu Leyla ez weke Mecnûn", pê re sê çar zarokên dirankerimî û ketî serê xwe li ber kameryê di ber hev de radikirin.

Hevalê ku bi min re li M. Şêxo guhdarî dikir digot, "Strana 'pêjna te nayê' çiqas xweş e, ku welatê jibîrbûyî, yara dûr, evîn û her tiştê xwe tîne bîra mirov." Hîn gotina wî di devê wî de bû, strana "pêjna te nayê, pêjna te nayê" derket, Lê pê re pê re kerekî spî û piştî yê qirşikan li ser derket.

Ji wê rojê de her ku hevalê min li wê stranê guhdarî dike, ne welat, belê ew kerê spî tê bîra wî. Vêca hîn tu televîzyon di cîhanê de bi vê teknîkê an bi van kilspan nehesiyane; û wê çêtir be ku pê nehesin jî. Ji bo ji dêvla bexçe ve beroşa bi tenî neyê bîra mirov û ji dêvla gulê ve xiyarê kesidandî û ji dêvla yarê ve kerê sipî û ji dêvla muzîka kurdî ve beroşek girar!..


bela xwe ji
ATV
dan jî dev ji
ye û daye
n!.. Tu dibê
ji bes ji
êk tê.
razî be.
anên ku
li hev tên!..
nd mînan
êxo digot,
çê gulan",
zilamekî bi
yên xwas,
paqij dikir
bi çakûç û
etibûn.
veke bilbil
pê re
û ber çerxê
belav dibûn.
i nav baxan
pê re yekî

BEREDAYÎ

ISPI ÇOCIXÎ, ÇEND XWARZIYÊN
!?!.. DER Û DORA ME TEV
NE!.. TU DERZIYÊ BIAVÊJÎ,
ERÊ XWARZIYEKÎ BIKEVE!..
I XWEŞ GÊBÛ XWARZÎ
ATORLIXÎ!..



Esref



* BENCIL.



EZING

Çsref
MUMCU



WEY WEY MALA
MINÊ!..
VÎ ZILAMÊ HANÊ
LI BAZAROKÊ WÎ
VEŞARTINE!..

NE WISA YE XALO!.. EW TIRBA
HACETÊ ÎBO YE. PIŞTÎ KU XANIMA
WÎ HACETÊ WÎ JÊ KIR, WESIYET
KIR Û GOT, 'KU EZ MIRIM, MIN
LI BA HACETÊ MIN VEŞÊRIN!'



CENGO ABÊ, PEHEE
MIN ÇI QARIZMAYEKE
DELAL ÇÊKIRNE, TU
DIBÎNÎ!.. EYNÎ BÛME
CIWAN HACO! KEÇIK
DEMA MIN DIBÎNIN,
DIHELIN!.. ÎMANA WAN
BI MIN TÊ!..

KUNDIR!.. BIMÎZIM DEVÊ
TE Û QARIZMAYA TE!..
TU DIÇÎ STENBOLÊ Û HER
SAL BI ÎMAJEKE NÛ TÊYÎ
GUND!.. LAWQ QEY KEÇIK
BI ZORÊ TE DIECIBÎNIN!..
TU BÛYÎ QIRDIK Û SOSRET!..
PIŞKUL ÇÛ BAJÊR
BÛ LEBLEBÎ!..



TU TUNEYÎ EZ QÛNTAZÎ
TU TUNEYÎ EZ VÎRİKÎ ME
ERAQA BÊYÎ TE MÎZA KERÊ
NANÊ BÊYÎ GÛYÊ HESPE!..
LAWQ SERDAR ABÊ, MIN
ÇI HELBESTEKE SOSRET
NIVISANDNE!..

SERDAR ABÊ, BIKÛTE
HEFT Û HEFT BANÊ TÊ!
KURO LAWQ EZ JI BÊR
DERDÊ WE BIKEVIM
KU DERÊ GELO?..

- KASETA EŞOCAN DERDZADE DERKET!..
- 1) NAVÊ MIN BIKOLIN LI SER KERXANEYA
DIYARBEKIRÊ. (SLOW)
 - 2) YARA MIN RINDE, LÊ PIVÊ WÊ ZEHF BÊHN DIDIN!..
 - 3) TAMAMALA DIZINÊ JI YÊ HELAL XWEŞTIRE. (NIVÎ ROK)
 - 4) EZ KETIM DESTÊ POLÊSAN, DERPINE MIN JI MIN
KIRIN (HARD ROK)
 - 5) MIN TU LI KADÎNÊ ZEFT KIR (HARD METAL)
 - 6) KURO HÊDÎ HÊDÎ MIST BIDE (BLUES)



LAWQ, MIN ÇEND CARAN JI
WE RE GOT, 'MİKROFONÊ
NÊZİKÎ QÛNA MIN NEKIN!..



KA TEYÊ
QOLEKSİYONA
XWE YA PÛLAN
NÎŞANÎ MIN
BIDAYA?..


OXOO!.. EZ GIHÎSTIM MIRAZA XWE!..
JI VÊ SAETÊ PÊ VE TUVÊ ÇI BIKÎ PÛL Û
MÛLAN!.. KU TU PIR DIXWAZÎ, EZÊ
QOLEKSİYONA XWE YA PREZERWATIFAN
NÎŞANÎ TE BIDIM!..

QONANS




ZAZAYÊ HEYDO

ZAZAYÊ HERÎ XURTÛ QERASE.
DESTE BIRAKÊ QONANS. JI TIŞTEKÎ
NATIRSE.
MEYXUREKÎ TEMAME Û EWQAS
ÇÊRBAZ Û DEVÇEPEL E. KU QIRIX
LI BER ŞERM Û FEDÎ DIKIN.



TOLO

KÛÇIKÊ ZAZA HEYDO YÊ KURMÎ YE.
HER ÇEND GELEKÎ DILSOZ Û SADIQ E
JÎ, BI QASÎ KU JI BO HESTIYEKÎ
DEV JI XWEDIYÊ XWE BERDE ÇILEK Û
NEFSOK E!.. EW ÇEND TIRALE KU
MIROV TÊ DERNAXE DILIVE.



BRÛSK

HESPÊ KIHÊL Û BEZA YÊ QONANSE. WEKÎ BAYÊ BEZÊ
BI LEZ E Û HER WIHA BÎRBIR Û SERWEXTE. BI QASÎ KU
CARNA QONANS BIXAPÎNE BAQILE.



QONANS

MA HEWCE YE MIROV WÎ BIDE NASÎN.
HER ÇEND CIL Û KINCÊ WÎ BIGUHERI-
BIN JÎ, EW QONANSE ME YÊ EGÎD
Û ŞERVANE!.. KEREM KIN, SERBORI-
YÊN WÎ BIXWÎNIN!..



EWAN

JIXWE NAVÊ WÎ LI SER E!..
EV MIROVÊN HANÊ WEKÎ NANÊ
SÊLÊ NE; DURÛ NE. XWE JI ME
DIDIN XUYAKIRIN, LÊ HER TIM
LI DIJÎ ME NE.



FATÊ

HEMA BÊJIN MÎNA QARA FATÊ YE. NÎŞANEYA
BERXWEDAN Û DILAWERINÊ YE. EW DAYIKA
ŞERVANEKÎ YE. DEV JÊ BERDIN!.. JIXWE
DEMA WE XWEND, HÛNÊ HÎN BIBIN!..



TARKAN

JIXWE HÛN WÎ DINASIN. SERKÊŞÊ NIJAD-
PERESTAN E. NEYARÊ KOKÊ QONANSE!
HÊTA, HÊTAYÊ!..



EZ

ËRRIK!...
EV KÎ YE?..
BI XWEDÊ EZ
JÎ NAS NAKIM.
XEM NAKE!..
DEMA WE RÛ-
PEL QULIPAND,
HÛNÊ HÎN
BIBIN! DIKÛVÊ
YEKÎ PÊ DIKEVE,
LÊ...




Beşa Duyemin li rûpela 12 e



ÇO.. ÇOO...
DEH.. DEEH...
DEH!..

REQEDA...
RUKEDA..



DE BIBEZE
SEGLAWIYÊ MIN
BIBEZE!..

REQADA!..
RUKEDA.....



QONANS ALARM!..
LEŞKERÊN ROMÎ HATIN!..
HING... AXX... AX...

G
I
M!
...

HHHHHHHHH!!!



EW ÇIMA WISA PIR
DITIRSE,
MIN FÊM NEKIR!..

MIN JÎ!.. BI TENÊ
MEYÊ ŞER BIKIRA
KURO!..



EM JI DAYIKA FATÊ RE
NEBÊJIN!.. TU ZANÎ
EW DAYIKA AŞTNE
YE!..

ERÊ
WELLEH!..

DÊ BICOME

ÇIMA ?



LI AMEDÊ POLÊSAN AVÊTIN SER KEWAREKÊ Û CIXAREYÊN DELALÊ DESTESER KIRINI..

ROJÇÊBÛNA PÎNEKENAN!..

Pencereya Peyvê

ahmad.hussayni@nefel.nu

EHMED HUSEYNÎ

Pînevano!

Hespên êşê bi kêrî cirîda laşê me yî dabeşkirî nayên, û rengên me jî têra nehwiirînê nakin. Devê çîyan li me nagere, da ji me re mirinekê hilbijêre û dilên me yên ji tavên matmayînê, bispêre kevirekî ji kevîrên gora xewnê, da em xwe û dûmana peyvên xwe ragihînin herikîna sirûdên riswayiya pencereyên vê sedsalê.

Dilê min nabije berbanga reşekujiyê û ne jî çavê min ji şevistana we hez dike.

Li wan deverên we yên veçirayî, dema ku ronahî pêrgî axînên-min dibe, nîfiran bi ser min de dibarîne. Destên min girêdide, zimanê min dişewitîne û reşekonekî di dilê min de vedigire.

Îca ez dê bi kîjan zimanî salvegera we pîroz bikim? Ango ez dê bi kîjan mirinê berê peyvê bidime goristana derbirînê?

Rexên me yên ku xelkê piştî talanê ji me re hiştine, teng in. Rexên me êdî nema têra axîn û girî û sosretan dikin, rexên me wek çavên dayikên me li dûrahiyan dinihêrin û bêhûdeyiyê ji ber dikin.

Sed sal ji êrîşên hovane, da ku giyanê kurd zuha bibe. Sedsaleke bêyî bêhnvedan, da ku mewjî di xewnên me de bibine gulle, da ku bîhok di nav cil û bergên xwişkên me de bibine kevir, da ku **Cizîriyê Botan** bibe serbirê(celadê) evîna me, da ku **Feqeyê Teyran** bibe rêber û şopegerê mişextî û revendiya laşê me. Sedsaleke bêyî bêhnvedan, da ku em rengên tûj û germ ên kiras û xeftanên dayikên xwe û lorînên ji velerzînê yên dapîran ji bîr bikin.

Wisa, ro li nivro, li ber çavê vê cîhana ku mirovatiya wê di ser dev re çûye, em hînfî ramanên paqij û hestên paqij û dîroka paqij û cografyaya paqij û zimanên xwe yên pir paqij, kirin.

Wisa piştî ku laşê kurd bi sînoran dabeş kirin, êdî giyanê kurd jî bi sîngoyên şaristanî û ziman û dibistanên xwe kuştin.

Aniha em şagirt û neviyên sê şaristaniyên cihêreng in, em bi kurdî navê pênc gulan dizanin, lê bi tirkî û farisî û erebî navê pêncî.

Êdî pêwîst nake em li sedemên birakujiyê bipirsîn, êdî pêwîst nake em li ser merc û egerên têngihiştina hev rawestîn. Pêwîst e em li xwe, li hişê xwe, li bîra xwe, li zimanê xwe yê ku kesayetiya me ye bigerin.

Lewre ez serhişkiya we pîroz dikim; serhişkî bo bikaranîna zimanekî birîndar, tolgirtin e, xwe vedîtin e, rakîşandina jiyane ber bi li xwemikurhatinê ve ye.

Pîneyê spehîtir bikin û ji ezmûneya xwe sûdeyê wergirin, zimanê wê bi çerxa exlaqên rewşenbîrane û bi wijdanê rojnamevaniyê tûjtir bikin. Berê xwe bidin giyanê kurd ê zuha, da ku bi dilopên peyvê geş bibin.

Pînevano!

Ji pencereyên asê, ji rexên vewestana dîroka pîrozbahiyên giryanê, ji xwekuştina şevçirayên xewna tagirtî ya zersoninên welatê min, silav!..

Ji bin siya perên şikestî yên kevokên peyvê, ji rondikên rohilata birîndar, ji çurîsîna xunava li ser hinarkên şehîdekî kurd, silav!..

Ji keviya surdarî û matmayîna dayikên kurdan ên ku xwînê û bêrîkirinê bi teşiyên bendemanê dirêsin, silav!..

Ji reşgirêdana kulfîkên çîyan û ji nehwiirîna stêrkên esmanê xerîbiyê, dîsa silav!..

Têbînî: Ehmed Huseynî, ev nivîs wekî peyama salvegera Pîneyê şand, lê ji ber watedarî û balkêşiyê em diweşînin.

ANKETA SED DERS Û SED KULAN

Çavê min, li ser daxwaza we em anketê cardin diweşînin. (berde binê te erd el.. Kesî nebihîst!?)
Me got xwe sist bikin, lê ne ewqasî!.. Heyran hinekî cidî û giran bin!.. (Bi xwedê henekên we ji nivîskarên Pîneyê qerasetir in!..)
Hinekî xwe giran bikin, tenê carekê, û anketê bibersivînin!..
Hûn ne mecbûr in navê xwe binivîsin, îca hûn bi kêfa xwe ne!..
Anketê bişînin ser vê navnîşanê: **Istiklâl Cad. Ayhan Işık Sok. 19/1 Beyoğlu/Ştenbol**

Nav:.....
Kar:.....
Asta Perwerdehiyê:.....
Azeb an zewicî:.....
Bajar /Navçe:.....

- 1) Kêfa we ji kîjan aliyê Pîneyê re tê?
- 2) Îmana we ji kîjan aliyê Pîneyê diçe?
- 3) Berî Pîneyê kurdiya we çawa bû, piştî Pîneyê çawa bû?
- 4) Hûn çiqas bi kurdi dizanin?
- 5) Heta niha we kîjan pirtûkên kurdi xwendin?

- 6) Ji bilî Pîneyê hûn kîjan rojname û kovaran dixwînin?
- 7) Ji nivîskarên Pîneyê hûn kê dicibînin?
- 8) Zimanê Pîneyê giran e an sivik e?
- 9) Kêmasiyên Pîneyê çi ne? Divê çi bike?
- 10) Ji nav pirtûkên ku we herf zêde jê hez kiriye, navê sê heban binivîsin?
- 11) Kêfa we ji kîjan hunermendan re tê?
- 12) Hobî û fobiyên we çi ne?
- 13) Li mala we Medya TV heye?
- 14) Dê û bavê we li malê bi kurdi diaxivin?

- 15) Zaravayê we kîjan e?
- 16) Hûn dixwazin kî bibe nivîskarê Pîneyê?
- 17) Hûn dixwazin kî bibe xêzkerê Pîneyê?
- 18) Hûn her tim Pîneyê dixwînin?
- 19) Ji bilî we çend kes Pîneyê dixwînin?
- 20) Hûn Pîneyê jî ku distînin?
- 21) Di kanalên televizyonan de kêfa we ji kîjan bemaşeyan re tê?
- 22) Li mala we kompîtur heye?
- 23) Hûn bi înternetê re têkildar in?
- 24) Hûn dengê xwe didin kîjan partiyê?

- 25) Ji kîjan helbestvan û nivîskarên re kêfa we tê?
- 26) Hûn kîjan tîp û karakterên Pîneyê hez dikin?
- 27) Ji kîjan tîp û karakteran re kêfa we nayê?
- 28) Hin henekên Pîneyê yên ku kêfa we jê re hatiye binivîsin?
- 29) Li ser Kundir hûn çi difikirin?
- 30) We parçeyên din ên welêt dîtine?
- 31) Hûn li ku mezin bûne?
- 32) Dema hûn zarok bûn we bi kurdi dizanî û li çîrok û dengbêjan guhdarî dikir?

Ji Weşanên Welat bixwazin

Amed

Kıbrıs Cad. Türk Hava Kurumu Apt.
Kat 4. Tel: 412 223 34 83

Wan

Belediye İş Merkezi
Kat 1. D 106
Tel: 0432 215 64 26

Batman

Yeni Mah. 711.Sok.
No: 27 Kat 2
Tel: 0 535 319 46 15

Riha

Kunduracılar Pazarı. Özpölat İşhanı. Kat 3/5
Tel: 0414 216 81 07

Edene

Kocavezir Mah.
Karacaoglan Cad.
Aziz Pamukçu İş Merkezi
Kat 3. No: 23
Tel: 322 351 42 78


İzmir

1420 Sok. Koyuncular
Apt. No. 12. Kat 5.D.5
Kahramanlar
Tel: 232 446 19 50

Mersin

Çankaya Mah. 4709 Sok. Eser İşhanı Kat 1.D. 5
Tel: (0324) 237 66 49

**Kerem
kin, li
axaftina
Serok û
Sokrates
guhdarî
bikin!..**



DERKET

Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi) **M. Nuri Karakoyun**
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):
Mazlûm Doğan, Doğan Güznel, İmam Cici

■ Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
■ (Yazı İşleri Müdürü) **Abdurrahman Pekedis**
■ Navnîşan (Yönetim Yeri) **İstiklâl Cad. Ayhan Işık sokak.19/1 Beyoğlu/ İstanbul**

■ Tel: (212) 292 72 70
■ Fax: (212) 251 95 85
■ E-Mail: pinedank@hotmail.com
■ Kargerî (İdare) (212) 251 79 37

■ Çapxane: **Aspaş Matbaacılık.**
■ Yayın Koordinasyon
Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.
■ Belavkirin **BİRYAY Dağıtım**

■ Nûmergeh: Edene: (322) 351 42 78
■ İzmir: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49



BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Gelî hevalên aqilfiroş! Hûn li ser pêşveçûna dinyayê û paşveçûna Tirkiyeyê, nirxandin pêşniyar û "çözümlemeyan" dikin. Gelek caran jî hûn aqil didin kalikê xwe û şîretan li Serokomr A. Nejdîet Sezer dikin. Lê qet nebe carekê jî we di neynikê de li xwe nenêrî û du-sê mû ji pozê xwe yê kumî hilnekir.

QUŞXANE Ên berî nivro...



Elooo! Hûn li sazî û komelê şîr û şekir in, lê li malê şîr û sumaq in. Li derve hûn kîvroşka kedî ne, li malê gureboz in. Dema ku em dibêjin "Heval kêmasiyê we hene, 'yönelmiş' xwe bibin!..", hûn aciz dibin, diçin li malê û bi xwişk û birayên xwe re şer dikin û aştîya navxweyî xira dikin. (Kürt halkı seninle gurur duyuyor hevall..)

MOZ Ên piştî dana pez




Siyasetmedarbûna we, wekî kumê şêxê gundê me di nav civakê de tê ecibandin. Li dema ku hûn tê de biborin, dibê cihê mîtingê. Bi gotinên we civat dicoşe. Lê hûn ne hêjayî çepikekê ne jî. Hûn hîna jî krîterên gundê xwe û yê Kopenhagê tevlihev dikin û hûn hîna jî li ber Qesra Spî, li benda Godot ne. (Ma hewceye em tiştê din jî bêjin!)

CAŞIK Ên ber êvarê...



Hevalên xwendekar! Di zanîngehê de hûnê dil berdin xortekî/keçeke çeleng û qeşeng. Hezkiriya/ê we, dê we fêrî ziman û çanda kurdî bike. (Heval bu bir talimattir). Piştî fêrbûnê, hûnê çîroka bi navê "Kîlîda netewbûnê ziman û çand e.." binivîsîn û ji Ecewît û hevkarên wî re bişînin.

ZIRNE Ên nivê şevê...



Hûn ji gund hatin navçeyê, we cemedanî avêt, şewqe wergirt. Li bajêr jî papyon û qrewat girêda. Dema ku hûn çûn metropolan we porê xwe boyax kir, li Ewropayê jî estetîk kir. Ji xeynî hacetê xwe (vê jî xwedê dizane) we her tiştê xwe guherand. Lê we mêjiyê xwe neguherand.

HUDHUK Ên heft mehi hatine...



Hevalê Zeus cixara xwe vemirîne û guhê xwe baş bide me!.. Hevala Afrodît wê li ser we jî reklamekê çêke û wê bêje 'Ayooool ma qey ez Osman Dumuş im, ku ez te bixim îsekî de, ma qey ez Ehmedê Xanê me ku ez bêjim li şûna wê marboroyê, pirtûkekê bikire. Hem tu jî dizanî, ku pîrpirên min tunene, ku ez 'talimatan' bidim.

Partiya me ya nû li ser xêrê bel...

PARTIYA EZ QURBANA XWE ME!..

Diyar bû ku li Kurdistanê partiya kurdan a herî kevn 'Partiya Ez Qurbana Xwe Me- Kurbanam Kendi Kendime Partisi' ve.

Lêkolînva Yildiz got me bema Şaristaniy Mezopot amade di di nav berhemêr dîrokî yê hezar salî de rastî navê


'Partiya Ez Qurbana Xwe Me' hatin, ku li Kurdistanê rêxistina herî kevn e. Ev rêxistin bi taybetî li Amed, Bazîd,

Silêmanî, Riha, Qamişlo, Bedlîs û Vartoyê bi hêz bûye. Gelê van deveran tev endamê vê partiyê bûne. Kesên wekî

oî, Gilgamiş, Nûh, Baba Jryan û ew jî di nav mênê vê partiyê de cih girtîye.

Diyar bû ku piştî vê lêkolînê wşenbîrên

van deveran, dîsa ji bo zîndekirina partiya xwe, ketine nav tevgerê. Wê di dema pêşiya me de li ser vê babetê daxuyaniyek bê ragihandin.



BELQITÎ (Qehremanê rezew)

Belqitî diçe Fransayê. Bihîstiyê ku Frensî çî biaxivin di dawîya peyvê de dibêjin'siyon.' Birçî dibê, xwe diavêje aşxaneyê. Ji xwe re dibêje, 'Ka bise!.. Ezê jî bi van segbavan re bi frensî biaxivim, bila fêm nekin ku ez biyanî me.' Bang li garson dike, 'Garsonsiyon şorbesiyon bînesiyon.' Garson şorbeyê tîne.

Belqitî dîsa gazî dike, 'Kebabsiyon bînesiyon.' Garson kebabekê jî tîne. Belqitî dîsa, 'Garsonsiyon adîsiyon.' Garson hesêb jî tîne. Belqitî dipirse, 'Brazilsiyon tu ji kuderîsiyon?' Garson, 'Ez ji Amedê me.' Belqitî dibêje, 'Ehmeq tu çima nabêjî!.. Ji şefeqê ve ez bi te re frensî diaxivim.' Garson: 'Ku ez ne ji Amedê bûma, teyê quzilqurtisyon bixwara, lê neysel!..'

NAVÊ KUTIKÊN ÎRO: (xizmeta Kundir a civakî)

KURIK: Hemoş Qûnberoş, Eto Binalisto, Qutbetîn Qitî, Filîtê Hûrfilîtî, Nûrî Berbûrî KEÇIK: Sosê, Çoçê, Hotê, Qerê, Tikê, Şikê



- Xwedê heqê min ji Mûrat Batgî stand. Cabbar Leygara
- Her cure dafik û teslîmiyet bi fîna tê kirin. Hizba Qadirê Perekês
- Ferhenga Zimanê Cahid Merwan derket. Bêba Sêla Sor
- Ez hemû mîrasê xwe diyarî Ecewît dikim. Fischer
- Kî dibêje Mistefa Kemal ne demokrat bû, hûnê bibînin ezê di meclîsa wî de bibim mebûs. Mehmet Metiner
- Brawo ji te re şêrê Mezopotamyayê. Rêxistina Mizdanvarian
- Gulê, Fatê: ka darê min bînin, xwedê ji min û komara tirkî mezintir e. Nadoyê Mitrib
- Hawar e!.. Çakêt û derpiyê min hatine dizîn. Barzan Şahsiwar
- Eve 65 sal e min karî tîlêwîzyon kirdûye, min le jîni xwo wek Mîdy TV nedûye. Zor çak e. Husên Rêber.
- Em betilî û her çû em kêmbûn. Demokrasi Hareketi

ELO CIMŞÎD: (bernameya heftê malbata we)

- Temeşevanên seyrbelêş li studyoyê birêz Mehmûd Teqşî amade ye. Niha Emoş li ser telefonê ye... Emoş Beg kerem ediniz lutfen.... Mijara me demokrasî ye...
- Emoş: De, de, demok, mok, mokrasî...
- M. Teqşî: Kuro Emoş!.. Law xwedê bela te bide, mokrasî navê rejîma we ye law. Em demokrasîyê dixwazin. Here bela xwe di min nede. Jixwe ez prostat im.
- Emoş: Ne demek pros, pos, demok, demokros, pospros, prospektus?
- M. Teqşî: Kuro law ne prospektus. Te di xewna xwe de demokrasî dît!.. Xwedê devê te li hev bada. Ebleh, prostat yanê wekî ku tu niha diaxivî, ez jî dimîzim, te xwar...
- Belê temeşevanên tîlmaşa, piştî ku Emoş mat bû, niha jî niha jî Rêxo Mirdar li ser telefonê ye.
- Sayin Cimsîd ez pir heyecanî me, min îşev kabûsek dît ku demokrasî hatiye Tirkiyeyê û maazallah ez hînî kurdî bûme.
- M. Teqşî: Kexxaneçî tu ji me kêmbû. Tuyê hê hînî pir tiştan bibî. Cimsîd tu van qebraxan ji ku derê dibînî? Ka Mendebûr Keltoş, Ertug Kurkêkerê û El Fatih!.. Lawo ku hûn mêr in yeko yeko werin...
- Bernameya Cimsîd pirreng û pîrdeng e Mehmûd Beg!..
- Sayin kexxaneçî, pardon, yanê Mirdar Beg, (Birêz Teqşî we em jî hînî çêra kirin) wê Profesor Xwişka Cîncî, Ordîyamûs Yalçino Kuçuko û pisporên Pentagonê xewna we şîrove bikin. Niha wê birêz Teqşî ji me re kilamekê bibêje...

SOSRETA GIRAN!.. Li Başûr piştî maça tîpên fitbolê yê Zaxo û Dihokê şer derket, her du alî bi tanq û topan bi hev ketin!..

BARZANCAN ZÛ!
LEZ BIKE... BERÎ KU REQÎBÊ
ME WERIN, EM MAYINAN
BIQÎNIN!..

